Ji bo ciwanên bi diravên kêm xizmetên-BuT hene.

**B**u**T** kurtepeyva **P**erwerdehî **û** **H**evpişkiyê ye.

**Hevpişkî** tê vê wateyê:
Tevlê bibin, pişikdarî bikin

Bi hebûna BuT mesrefên tiştan kêm dibin. Wekî mînak:

- Geşt û rêwîtiyan bi dibistan û Kîta re
- Firavîn li dibistan û Kîta
- Pêdiviyên dibistanê
- Ders û waneyên kesane
- Diravên endametiyê jibo klûban
- Kursên avjeniyê
- Dersên mûzîkê
- Demên betlane

… û bêtir jî

**Li vir hûn dikarin agahdariyên bêtir bistînin:**

Telefon: 05 11 – 61 62 63 64
Email: BuT@region-hannover.de
Internet: www.hannover.de/BuT

Region Hannover

JOBCENTER REGION HANNOVER

**Pirsên din yên we hene?**

Li ser rûpela **www.Hannover.de/BuT** hûn dikarin agahdariyên berfire di derbarê karûbarên perwerdehî û hevpişkiyê û daxistina forman bistînin.

Agahdarî û şêwirdariya kesane dikarin bi rêya telefon an E-mail jî li tîma karûbarên perwer dehî û hevpişkiyê li herêma Hannover bistînin:

Telefon: (0511) 61 62 63 64
E-mail: BuT@region-hannover.de

Region Hannover

Fachbereich Soziales
Team Bildungs- und Teilhabeleistungen –50.11–
Hildesheimer Straße 20
30169 Hannover

Wêne:
Sernav: stock.adobe.com – valeriya_dor, stock.adobe.com –GraphicsRF
Hundir: © yanlev – Fotolia.com, © drubig-photo – Fotolia.com, © Kzenon – Fotolia.com,
© Gennadiy Poznyakov – Fotolia.com,
© grafikplusfoto – Fotolia.com

Plan:
Region Hannover, Team Medienservice

Xemilandin:
Matthias Rößler, Region Hannover, Team Medienservice

Çapkirin:
Region Hannover, Team Medienservice
Li ser kaxezê 100% veçerxînê hatiye çapkirin

Stand: Januar 2022




HANNOVER

**PERWERDEH Û HEVPIŞKÎ**
LI KÎTA, DIBISTAN Û VALATÎ

Fêdeyên diravîn ji bo zarok û ciwanan heta 25 salî

Region Hannover

## Xizmetên diravîn ya perwerdehî û hevpişkiyê çi ne?

Perwerdeh û hevpişkî di jiyana civakiyê de kilîda pêkanîna derfetên wekhev in. Fêdeyên diravîn ji bo perwerdehiyê û hevpişkiyê piştgîriya ciwanên malbatên kêm-dahatî dikin da ku bikaribin bizavên pêşkêşî yên wekhev di dibistan, Kita û valatiyê bikar bînin. Fêdeyên diravîn di warên jêrîn de mimkin in:

- **GEŞT Û RÊWÎTIYA BI DIBISTAN, KÎTA Û DAYÎNÊN ROJÊ RE**
  Mesrefa geştên civatî û rêwîtiyên çend-rojî ji xeynî xercên xîzanê, bi tevahî tên dayîn.

- **FIRAVÎN LI DIBISTAN, KÎTA Û DAYÎNÊN ROJÊ**
  Mesrefa firavîna civatî were dayîn.

- **PÊDIVÎYÊN DIBISTANÊ**
  Mesrefên ku ji encama beşdariya dibistanê hatine çêbûn, di Tebaxê de bi 104,00 € û di Şibatê de bi 52,00 € werin bijêwî kirin.

- **HATIN Û ÇÛNÊN XWENDEVAN**
  Heke navbera xanî û dibistanê zêdetir ji du kîlometran dûrahî hebe û mesrefa rêwîtiyê ji hêla cihe ka din neya dabînkirin, mesrefa hatin û çûnîn Xwendevan dikare bê dayîn.

- **PIŞTEVANIYA XWENDINÊ**
  Heke bi dest xistina armancên hînbûnê xwendevan pir zehmet be, mesrefên waneyên kesane tên dayîn.






- **XIZMETÊN JI BO HEVPIŞKÎ DI JIYANA CIVAKÎ Û ÇANDÎ YA CIVATÊ DE**
  Fêdeyên diravîn ji bo pêşxistina çalakiyên werzişî yên zarokan û ciwanan were dayîn – wekî endametiya klub, kilasên avjenî, demên valatiyê, dersên mûzîkê û hêjî bêtir. Ji bo her kesî, heyvî 15 Euro heye ku dikare di navbera pêşniyarên cûda de were parve kirin an jî ji bo çalakiyêk mezintir were xezinkirin.

## Kî dikare fêdeyên diravîn bistîne?

Kesên berketî, kesên ciwanin heke ew an malbatên wan, yêk ji wan xizmetên jêrîn bistînin:

- Diravê bêkariyê II (SGB II)
- Alîkariya civakî (SGB XII)
- Diravê xanî û diravê dabînkirina zarokan (§ 6b BKGG)
- Xizmetên penaxwaziyê (§§ 2 an 3 AsylbLG)

Heke kesek tu ji xizmetên jor nestîne û mesrefên perwerdehî û hevpişkiyê jî nikare dabîn bike, derfet heye ku hewcedariyên xwe yên takekesî ji bo xizmetên perwerdehî û hevpişkiyê bide fehs kirin.

Mafê xizmetên diravîn ji bo zarokan û ciwanan e, heta 25 saliyê diqedînin. Xizmetên diravîn ji bo hevpişkî di jiyana civakî û çandî ya civatê heta 18 saliyê de tên dayîn.




## Ez çawa dikarim fêdeyên diravîn bistînim?

Xizmetên diravîn ji bo perwerdehî û hevpişkiyê divê bên daxwaz kirin. Daxwazkirin dikare bi rengekî ne fermî bê çêbûn an jî bi awayekî fermî bi tijîkirina formekî ku hûn dikarin li herêma Hannover û ofîsên civakî yên bajarê û şarevaniyê an jî bi rêya navnîşana întêrnetê www.hannover.de/BuT bistînin. Şirovekirinên zêde di derbarê awayên cûda yên daxwazkirinê li ser întêrnetê têne weşandin.





